

Nerîn li ser Konferansa Jinên Navnetewî

Di 5 û 6'ê Mijdarê, 2' ê min Konferansa Jinan a Navneteweyî li Paytexta Almanya Berlîn, ji aliyê "Tevna Jin Siberojê Dihûnin" bi Şîara " Şoreşa me: Azadkirina Jiyanê ye," hat li darxistin û em jî wek SMJÊ (Sîwana Meçlisên Jinen Êzîdî) tevli vê Konferansê bûn. Mê êv Konferans e, ku bi peşengtiye Jinên Kurd û bi Dirûşme JIN JIYAN AZADI pek hat û ji 41 Welatan tevlî bûn û bi 8 Zimane wergertin bû, ev serkeftineka bi serê xwe dit. Ji bo me, wek Jinê Ezîdî careka din hata nişandan, bê dijmin çawa bi rexistinbûna Jina Êzîdî açize û nikarê vê yekê qebûl bike. Ev yek di asteng kirina hatina Femandare YJŞ HÊZA xwe da diyarkirin û Massage li diji me, dana me Jinên Êzîdî.

Di vê nuqtê da, hata diyar kirin ku di vê serdema Internetê da dûrbuna fîsîkî bê wate kiriye û di riye dijitalê/ teknolojiyê de dîsa Peyama Femandare YJŞ HÊZA hata dayin û bi 8 Zimane hate wergertin. Hat diyarkirin ku Jinên bi rêxistin kiri, xwe li gorî demê jî amade kirin e.

Wek ku me anî Ziman, em wek SMJÊ tevlî Konferenze 1' ê min jî bûn û vê demê tevlî Konferenze 2' e min jî bûne. Me di herdûk Konferenze de, di derbarê Ola Êzdatiyê de, girîngbûna bi rêxistkirina Jinên Êzîdî û Rola Jina Êzîdî di nava Çivaka Êzîdî, derbarê vê mijarê de, Bêguman me Semînar jî dan. Di Konferenze 2022 ku pêk hat, ku Jin ketina nava wê ferqiyê, ku êdî Azad nebin, wê nikaribim Azad bijîn û li Mafê xwe xwedî derkevin. Ya baldêr ew bû ku her Jineke, derket pêş, axaftineke Rêberê Gelê Kurd anî ziman û Jina Kurd di derbarê Tekoşîn û rêbertiyê, wek mînak ji xwere dît. Di 2018 da, em wek Jinan li seran seri Cihanê, di nav hewl dana de bûn, em çawa karin Yekîtiyeka xwe ava bikin û li hemberî qirkirina Jinê bisekinin. Herwiha em di nava hevaskirinê de bûn. Di Konferansa 2' ê min da, me hewl da, bê em wek Jinên Cîhanê çawa karin pêşenkîtiye, ji Azad kirina civaka xwe re bikin. Herwiha, her jineka li wir amade bû, têgihîştî bû, ku wateya JIN JIYAN AZADI çiyê û çiqas Jinen Kurd di vê oxirê da, xwîna xwe daiye.

Tiştê herî balkêş ew bû ku, Jin li seranserî Cîhanê êdî Pirsgirekê Jinê naskirîya û êdî li çareserîya jiyanê Azad digerihihin û ketina wê ferqiyê, ku ev Jiyanê Azad, ne bi torhûnandina hevbeş be, wê nikaribû ji ber xelas bê. Ji ber wêkê bîrîyarê girîng di wir de hat dayîn. Di Peşarojê de, divê em hê zedetir li ser kar, xebat û tekoşîna jina a hevpar bisekinin. Em jî di wê baweriyê mezin de ne, ku ew biryar wê bi çîh bîn û bi berxwedana Jinê û Silogane JIN JIYAN AZADÎ wê mirovayî Azad bibe.

SMJÊ (Sîwana Meçlisên Jinên Êzîdî)